

Bi hatina Reyîsî
jî piştî Îranê li
navçeyê her vala ye

»»» R:7



Ber bi Gelawêja
Kurdan ve

»»» R:3



*Bideştveanîna mafên netewî yên gelê kurd
di çarçoveya Îraneke demokratîk û federal de*

Agirî

Duheftînameyek Siyasetî-Gîştî Ye, PDK Îranê diweşîne www.kurdistanmedia.com/kurdî
www.agirimedia.org Hejmar (403) 07-08-2021 Buha (1000) Tûmen

Êrîş di hember çî de?

»»» R:4



Efxaniştan û
leyîza qumarê

»»» R:8



“Dewleta Înqilabî”; Serkut li navxwe û fitne li derveyê welat

Rêûresma desbi-
kurbûna Îbrahîm
Reîsî Serkomarê nû yê
rejîmê roja Pêncsemî
14'ê Gelawêja 1400'an
a Rojî, li meclîsa rejîmê
di bin keşûhewayeke bi
tevahî ewlehî û polîsî li
Îranê bigiştî û Taranê
bitaybetî bi rê ve çû.

Di wê rêûresmê de
Reîsî wek heştemîn
Serkomarê rejîmê, li
ser çend destwaje û
wateyeke kevin bo
Komara Îslamî ku di
hundirê xwe de nixrên
cîhanî ne û cihê rêzê
bo xelkê dinayê ne
tekezî li ser kiriye; Ji
wan jî mafê mirov!

Navbirî di axavtinên
xwe de behsa vê
yekê kiriye ku “em
parêzerê rasteqîne yê
mafê morov in” ku di
“Îrana nû” de ji ber
çav digirin û bi ava-
kirina “Dewleta Înq-
ilabî” her cure dest-
dirêjîyek bo ser mafê
mirovên bêtawan,
çî li Amerîkayê be
çî Ewropa, Yemen,
filîştîn û Sûriyê be em
şermezar dikin û em ê
li hember wê derkev-
in!

Pêka gotinên navbirî
“Îrana sedeya paniz-
deh”, “peyama guher-
inxwazî, dadperwerî,
serbixweyîxwazî û li
hemberderketin li dijî



zêdexwaziyên sitem-
karan pê ye!”.
Ew axavtinên Reîsî
li rêûresma mala-
vayîkirina Rûhanî û
hatina ser kar a xwe
di demekê de ye, ku
tenê çend roj berî wê
rêûresmê û ji ber çavê
dinyayê xelkê nerazî
di çendîn herêmên
Îranê ku yek ji wan
herêma El-ehwazê bû
li hember siyasîyên
şas û bikêrnehatiyên
Komara Îslamî hatine
ser şeqaman û dijî te-
vahiya Komara Îslamî
silogan dan.

Çendîn xwenîşandan
ku di heyameke kurt
de çendîn navçe û
parêzgehên din ên
Îranê ji xwe girt,
carek din bo tev din-
yayê hate eşkerekirin
ku Komara Îslamî
li cem xelkê Îranê ti
rewatiyek wê nemaye

û tenê sedema mana
wê pêk hatiye ji hêzên
serkutkar ên rejîmê
û destê fitneçiya wê
di derveyê sînoran
de ku di bin siya hin
danûstandinên bazir-
ganî digel welatyên
din tê perdepoşkirin.

Ew di demekê de
behisa asayiş û aramiyê
dike, ku niha me-
clîsa rejîma wî mijûlê
sepandina gellaleya
naskirî bi “Siyaset li
torên civakî” ye û her
ew meseleye bilî vê ku
keşeke derûniya xirab
bo xelkê afirandiye û
aramî ji wan standiye,
bûye sedemek bo ne-
hêlana karûkasibiya
wê komela xelkê ku
ji rêya torên civakî ve
hewila dabînkirina bi-
jîva jiyana xwe didin!
Ku wisa ye ev asayiş
û aramiya Reîsî behsa
vê kir, niza li Çîn,

Koreya Bakur yan li
Kubaya hevpeymanan
Tehranê bê dîtin! Bilê
wê meselê jî, gelek ji
karnasan baehsa vê
yekê dikin ku armanca
Reîsî ji bikaranîna
destwajeya “Dewleta
Înqilabî”, di rastî de du
rehend e:
Yekem, dewletek
Înqilabî rû li der-
veyê sînoran ku tevî
berdewîkirina siyas-
etên berê ên dewletên
berê, ku rohn e li
çarçêveya teoriya
Xumeynî û Xamineyî
bo şoreşê pênase bo
tê kirin, tê de hewil
bo fitneçêkirin û mu-
daxilekirina zêdetir
û afirandina aloziyên
zêdetir tê dan.

Îsbatkirin wê axavtinê
jî dikare êrîşa çend
rojên derbasbûyîya
Tehranê bo ser belem
û gemiyên Îsraîlê
û herwis axavtinên
Hesen Nesrullah
ku pêwendî digel
dabînkirina şewat û
derman bo Lubnanê
be. Bi vê watayê ye
ku Komara Îslamî
zêdetir ji berê hewil
bo detvalahêstina
girûpên wek Hizbullah
li derheq cîbicîkirina
fermanên xwe dide
û êrîşên rastevxwe û
naraştrevxwe dike ser
berjiwendiyên welatên
deverê.

Rehenda duyem di
rastî de pêwendî bi
navxweyê Îranê ve
heye, wate dewleta
Înqilabî ya ku ji aliyê
Reîsî ve bo xelkê
rûniştîyên cugrafiya
Îranê pêk hatiye ji
serkuta zêdetir a nera-
ziyan û cudabîran,
girtin, lêdan, kuştin
û îdama çalakvanên
siyasî û medenî û
jîngehparêzî ku dax-
wazkarên mafên xwe
ên destpêkî ne da ku
bi vî awayî ku îşare pê
hate kirin ji hevpey-
manên xwe ên dîkta-
tor wate Çîn û Kuba û
Koreyê pare nemînin
û bikare wek berê û
baştir ji berê jî bibine
xwediyê wê kêbirkêyê
ku pêk hatiye ji serkut
û bînpêkirina mafê
mirovan.

Ca di vir de carek
din girîngiya hebûna
hevpeymanek di asta
seranserî û di nav
gelên Îranê de xwe
nîşan dide ku hekî
neyê pêkanîn û en-
camdan û hevahengiya
baştir û biplantir neyê
gorê, eva divê çavni-
hêriya rojgareke taltir
ji berê bin ku di siya
“Dewleta Înqilabî”
de û bi rênimîniya
fermana “Ateş bi
îxtiyar”îya Xamineyî
li dijî netewên sitem-
lêkiriyan Îranê bê
encamdan.

Sergotar

Girtîgehek di nav girtîgehê de

N: Kerîm Perwîzî

Jiyan di Îranekê de ku sîstema Koloniyalîstî li ser hakim e, ne ku jiyanekê bi azadî nîne, belkî jiyanekê teji rojreşî û sivîkatîkirin e, mirov dikare wê jiyankirinê di girtîgeheke mezin a bi navê Îranê pê nase bike.

Koloniyalîzma hakim, cugrafiyaya berfireh û çend neteweyîya Îranê kiriye girtîgeheke berfireh ku mirov tê de ji dayîk dibin û di wê girtîgeha mezin de temenê wan heder diçe û bi bindestî û bareke giran a sivîkatîpêkirinê, jiyan wan bi dawî tê.


Di wê girtîgeha berfireh de, rejîma “Wilayeta Feqîh” di hemû bajaran de girtîgeheke dinê ava kiriye û ew mirovên ku bi kêmekê hizra cuda hebin û dinyayê bi çaveke dinê mêze bikin binçav dike û dixê girtîgehê, heta ku aramiya wê girtîgeha berfireh aloz nebe.

Di nav girtîgeha betonî û deriyên hesîn de bi pasevan û celadên Xamineyî tê parastin, ya ku ecêb e eva ye ku dûbare girtîgehe dinê ava kiriye! Yê ku tene binçavkirin di nav girtîgeha xwe de girtîgeheke dinê dibînin, lê vê demê beşek ji girtî ne ku bûne zîndanvan.

Di wan rojan de dengeke netirs hawar dikir ku girtîgeha netewên bindest di nav girtîgehê de ji aliyên hin girtiyên netewa desthilatdar ve, piştguh hatine xistin û tîlên rêsayî bi dora hizir û bawerên wan ve kêşandine.

Girtiya Kurd, “Mujgan Kawûsî” hawar dikir ku di girtîgeha Êvînê de li benda cengel! Beşek ji girtiyên Fars givaşa hizirî û hundirî dixine ser çalakvanên netewên bind

Peyama pêrozbahiya Lêpirsiyarê Giştî yê PDKÎ li derheq tomarkirina Hewramanê li Yuniskoyê



Peyama pêrozbahiya rêzdar “Mustefa Hicrî”, Lêpirsiyarê Giştî yê PDKÎ bi hilkefta bi fermînasîna Hewraman li listeyê cihwarên kevnar ên cîhanê di Yuniskoyê de.

Deqa peyamê wiha ye:

Hewraman wek navçeyek kevnar, bi dinayek destkevtên dîrokî di warê wêje, siyaseta, kelepur û ji hemûyan girîngtir bi piştevanê tev şoreş û berxwedanên Kurd hatiye naskirin.

Em kêfxweş in ku di dawî biryara Yuniskoyê de, ev navçeya Rojhilatê Kurdistanê kevtê nav listeyê cihwarên girîng ên mirovayetiye di cîhanê de.

Ev biryara Yuniskoyê nîşan da ku Kurdistan xwediyê dîrokek kevnar û netewa Kurd xwediyê şariştaniyeta kevin e.

Ez di vê derheqê de ji aliyê Partiya Demokrat a Kurdistanê Îranê ve pirozbahiyê li xelkê Kurd-perwer û xweragir ên Hewramana Rojhilatê û tev Hewramanê dikim.

Partiya Demokrat a Kurdistanê Îranê

Lêpirsiyarê Giştî

Mustefa Hicrî
9`ê Gelawêja 1400 a Rojî

est ku ew jî wekî wan girtiyên destê rejîmeke zulimkar in! Helbet vê jî dibêje ku beşeke din ji wan wîha nînin.

Renge wiha bê dîtin ku di girtîgeheke bi panatiya Îranê de û piştê li nav girtîgehên bi diwarên betonî, rejîmeke zulimkar desthilatdar e û eva wisa dike ku kiryarên mirovan di Îrana bindest de wiha lêbê û givaşên hundirê girtîgehê wa bike ku ew girtî bi wê şewazê reftarê bikin, lê dema ber bi derveyê Îranê ve jî diçin her heman reftar tê dîtin.

Li navbera wan kesên ku ser bi cugrafiyaya Îranê ne û ji destê rejîma zulimkar derbider bûne û reviyane derveyê Îranê, dûbare beşeke wan Farsên avarebûyî bi çaveke sivêkatî mîzeyê çalakvanên netewên bindest dikin ku di derveyê Îranê de çalakiyan dikin û li hemû cihekê hewl didin ku wan rastî tohmetan binin û ya ecêb eva ye ku hemen tohmetên Komara Îslamî ya Îranê li dijî Kurd, Tirk, Ereb, Belûç û Tirkemen dûbare dikin.

Eva dide xuya ku her wekî “Mojgan Kawûsî” di cihekê de gotibû: “Ew naxwazin bibihîzin!” Di rastî de hin kes û girûp li nav kesên girêdayê netewa desthilatdar de hene ku girtîgeha sereke di nav mejiyê wan de ye û bi dora hizir û dîtingehan diwareke betonî kişandine û wê girtîgehê bo tevahiya dinyayî digel xwe vediguhazin! Ew ti tişteke dinê nabihîzin û naxwazin bibihîzin! Bi herîfandina sîstema sitemkar hewce ye ku di pêş de girtîgeha mejiyê xwe biherifînin û bibînin ku di Îranê de çendîn netewên cuda dijîn ku hemû vekhev in û servetir ji hev nînin.

Ber bi Gelawêja Kurdan ve



N: Nûredîn Sofizade

Pîroz be 76`emîn salvegera Partiya Demokrat a Kurdistanê Îranê

Meha Gelawêjê di dîroka tevgera rizgarîxwaziya netewa Kurd de, hilgirê birge û tomarên pîroz û rojên deskevtan e, gelek rojên dîrokî di xwe de cih kirine, Gelawêj meha berxwedan û rabûn û şanaziya me Kurdan ne, em niha di nava vê meha Gelawêjê de ne û di deve-devê roja 25`ê Gelawêjê de ne ku bo me xebatkarên rêya azadiyê û bi taybet bo me xebatkarên PDKÎ, rojeke herî dîrokî û pîroz û girîng e, her li ber hindê ye jî ku hemî salê ew roje an ku 25`ê Gelawêjê jî aliyê evîndarên rizgariya Kurd û Kurdistanê û bi taybet li Rojhilatê Kurdistanê bi awayê herî bi şan têtê pîroz-kirin.

Di 25`ê Gelawêja îsal de PDKÎ pê dihavêje nava 76`emîn sala avabûna xwe, di sala 1324`an de û di roja 25`ê Gelawêjê de, Hizba Demokrat li ser bingeh û xîmê Komeleya Jiyanewa Kurdistanê, avabûna xwe ragihand û wekî Hizbeke xwedî program û serdemiyanê û modern xebat ji bona bideştveanîna mafê gelê Kurd dest pêkir.

Yekem car bû ku di dîroka tevgera rizgarîxwaziya Kurdan de, Partiyêke wiha bi armancên darêti û xwedî platform û bi bername, di nava doza Kurd de ji dayîk bibe. Rêber û avakerên Hizba demokrat bi berçavgirtina ceribandîna xebat û şoreşên Kurd yê berî vê demê, gelek baş seh bi vê hindê kiribûn ku hewce ye şoreş û doza rizgarîxwaziya Kurd, bibe xwediyê Partî û Rêxistînekê



ku bikare li egera neman û şehîdbûna rêberekê bimîne û berdewam be.

Lewra Hizba Demokrat yekemîn Hizb bû ku bû xwediyê wan taybetmendîyan.

1-Bernama siyas darêti û xîstê ber çavê hemî gelê Kurd da ku hemî kes bizanibe ku ew Hizbe bo çi xebatê dike û armancên gelek zelal di bernama xwe de weşandin ku armancên netewî û çareseriya pîrsa Kurd bûn. Dema ku koka rêxistînekê zelal hate danîn û armancên xwe li gelalleyekê de xistîne ber çavê gel, bê guma partiyek ku wiha armanc û daxwazên netewî gellale bike û bike bernama kar û xebata xwe, hingê ye ku hemî kes xwe di bernama wê de dibîne û derdorê wê kom dibe û wê partiyê bi ya xwe dizane.

2-Di dîroka xebat û doza Kurd de, bi avabûna Hizba Demokrat a Kurdistanê bû ku rêveberiya bikom bikarin wê partiyê bi rê ve bibin ku eva jî bi baldan û ezmûnwergrirtin ji şoreşên berê bû ku dema rêber yan serok yan kesê yekem ê tevgerê şehîd dibû yan dimir û yan dev ji xebatê berdida, ew şoreş jî ji nav diçû û şervan û xebatkarên wan şoreşan her kes diçû mala xwe, wekî eva ku tiştêk nemîne û çinebe. Lê bi avabûna Hizba Demokrat û bi hebûna rêberiya bikom, bo hemî kesê eyan bû ku di heyamê wan 76 salên borî de çend kes ji rêberên yekem û dehan endamên rêberiyê yan

şehîd bûne, yan dest ji xebatê kêşane, lê em dibînin ku PDKÎ her di cihê xwe de ye û berdewam e li ser hemen armanc û rêbazê û hebûna wê partiyê girêdayê bi kes yan kesaneke nîne.

3-Bi avabûna Hizba Demokrat bû ku gorî wî serdemî wekî partiyekemodern û demokratîk, birêveberiya Hizbê û endamên ku Hizbê bi rê ve dibin her ji asata Komîteya Navendî ve bigire heta asta xwarê, bi hîlbijartin û dengê hemî endamê Hizbê gorî pîveran têne hîlbijartin, eva jî bi berevajiyê şoreşên berê wê Partiyê bû ku serokeşîr, axa, mela, şêx yan keseke xwedî pêgeha civakî bi tenê serêxwe, xwe wekî serokê tevgerê disepand.

4-Bi avabûna Hizba Demokrat bû ku şert û merc ji bona endametî di wê Hizbê de hatine diyarîkirin ku wê pêkê kesê ku dibe endam, divê bawerî bi hin ji pîrensîpên wê Hizbê, erk û mafê xwe û armancên partiyê hebe.

5- Bi avabûna Hizba Demokrat bû ku ji bilî xebatkarên ku dibîne endamê Hizbê, parên dinê ên civakê jî hatine berçavgirtin ku renge heya wê demê li çi yek ji şoreşên berê de nedihatine dîtin, wekî Jinan, ciwanan, û xwendikaran û hemî cudahiyan nava civaka Kurdistanê. Partiyêke xwediyê wan taybetmendîyên mezin e ku heya wê demê bê mînak bû, her lewma ye ku gelek zû dibe

cihê hitbar û hezkirina hemî gelê Kurd ne tenê li Rojhilatê Kurdistanê, belkî dibe cihê hitbara hemî Kurdan li her çar perçên Kurdistanê û dibe hêviya gelê Kurd û şaxên hevşewê û kopiyên wê li Bakur, Başûr û Rojavayê Kurdistanê jî têne avakirin.

Her bi piştgirêdan bi partiyêke wiha ye ku 5 mehan piştê li ser destê wê, Komara Kurdistanê têtê ragihandin û wekî deskevtê serdemiyanê li parek ji axa Rojhilatê Kurdistanê de deshilat û îdareya dewleta Kurdistanê dicêribîne, ku di dîroka xebata gelê me de yekem car bû ku Komara Kurdistanê bi awayê herî pêşkevî bête avakirin. Herçiqas mixabin temenê wê Komarê û deskevtê Kurdan gelek kurt bû, lê gelek ezîmûn û wane bo gelê me û nivşên piştî xwe bi cih hêlan. Evên ku serwe hatine nivîsîn mirov dikare bêje pareke herî kêr ji nasnama bihêz û cihê şanaziya PDKÎ ne.

Ew Hizba di heyamê 76 salên borî de, şanaziyê bi vê siyaseta, esalet, xebat û qurbanîdana xwe diket, li pêxema bideştveanîna armancên pîrozên gel ku di bernama wê hizbê de bi zelalî dikevîne ber çavan.

Heya Hizba Demokrat xwediyê wan esalet û hêl û raştiyan be, bê guman dê her hebe û dê her cihê hitbara gel bimîne, û bê guma dê bigihîje wan armancan jî ku heya niha xebat jê re kiriye.

Êrîş di hember çi de?



N: Serbest Urmiye

Pêdvî ye rejîma Îslamî ya Îranê di hewla rizgarkirina xelkê xwe ji krîz û qeyranên herêmî û navneteweyî de be ku bi sedema kiriyar û siyasîyên çewt ên vê rejîmê pêsîra xelkên Îranê girtine û yê bûne sedem ku roj bi roj hêla xizanî û destkurtiyê di vî welatî de bilind bibe û gelên Îranê di civaka navneteweyî de xevle bikevin. Lê mixabin rejîm weke makîneya ber-hemanîna qeyranan, her carê di aliyeke cuda de qeyraneke nû derdixe rojevê.

Di çend rojên borî de bi firokeyên bê firokevan êrîş li ser gemiyeke nefthilgir a şirketeke Îsraîlê di behra Emmanê de hatiye kirin. Di êrîşa vê carê de dewleta Îsraîlê bi tenê zirar ber neketiye, belkî welatiyeke Berîtaniyayê û yeke Romaniyayê jî di êrîşa han de hatine kuştin. Di vê derheqê de û bi li berçavgirtina karnameya karê rejîma Îranê di kiriyarên hemşêwe de, her sê aliyên zirar dîtî, sûçê kiriyara han dixin stuyê rejîma Îranê. Herçend ku rejîma Îranê vê îdiaya wan weke bixtan dizane û hewil dide ku barê tawanê li ser milê xwe rake, lê ji bilî her sê dewletên navbirî, berpirsiyarên wezaretê bergiriya Emerîkayê û endamên girûpa “G7” wate heft welatên pêşkevî yên cîhanî jî rejîma Îranê berpirsiyar dizanin. Her di vê derheqê de wezîrên karê derve yên “G7”ê di daxuyaniyekê de ragihandine, ku reftarên han yên rejîma Îranê di kêleka piştevaniya rejîmê li taqîmên tunadjo yên herêmê de, gefê ji tenahiya navneteweyî dixwe û daxwaz ji Îranê kirine ku xwe ji her kiriyarekê ku li derveyê lihevhatinên navneteweyî be, dûr bigire. Berhema vê bûyerê her çi



be, bo rejîma Îranê xêncî qeyraneke nû, ne tişteke din e. Di demekê de ku roj nine ku welatiyên Îranê bi sedema bi cihkirina hêzên Spaha Qudis û taqîmên girêdayî bi vê ve nemaze di Sûriyê de, di encamên êrîşên arteşa Îsraîlê de nehên kuştin û rejîma Îranê ne tenê nikare çi bersivê bide, belkî raya cîhanî jî li dijî hebûna çekdarên rejîmê ye di herêmê de, di heman demê de rejîm bi kuştina welatiyên welatên din, hevalbendiya Îsraîlê bi wan re qahîmtir deke û hêcetê dide dest wan ku di berfihetirkirina sînorên qeyranan li dijî Îranê, dengê xwe bilind bikin.

Ji aliyeke din ve hemû hêviya rejîma Îranê bi vegeriya endamên lihevhatina bernameya navîkî wate “Bercam”ê ye bo destpêkirina gerreke nû ya gotûbêjan, da belkî heya qasekê bikare barê krîzên dasepandî yên civaka navneteweyî bi ser xwe sivik bike, lê daxuyaniya “G7”ê îşaretên erênî nîşan nade. Ji ber ku parek ji endamên girûpa han, heman endamên “Bercam”ê ne ku rejîma Îranê ji van bi hêvî bû ku hewil bidin bi vegerandina Emerîkayê bo careke din çalakbûna “Bercam”ê û rakirina krîzan.

Ji aliyeke din ve ji bilî her sê welatên zirardîtî di êrîş bo ser gemiya Îsraîlê de, dewletên yekbûyî yên Emerîkayê jî, bi tundî êrîş kirine ser Îranê û gefa vê hindê dikin ku êrîşa han bê bersiv namîne. Di demekê de ku piştî destbikarbûna dewleta nû ya Emerîkayê, rejîma Îranê hewil dida ku wan vegerîne nava lihevhatina navîkî û krîzên ku dewleta “Donald Trump” bi ser Îranê de sepandibûn, bi “Joe Biden” hilgirin.

Serbarê gefên dewleta Îsraîlê bo êrîşa leşkerî bo ser Îranê, dewleta Îsraîlê îlan kir ku wan di konseya ewlehiyê ya “NY”ê de jî dosiye li dijî Îranê vekiriye û hewil didin ku li rêya alîkariya navneteweyî Îranê neçar bikin ku destan ji kiriyarên xwe yên tund û tûj berde. Di heman demê de her du wezaretên bergirî û karê derve yên Îsraîlê di daxuyaniya xwe de anîne ku li hember her gef yan êrîşekê li ser welatiyên wan de, dewleta Îsraîlê mafê xwe dizane ku ser bi xwe biriyarê bide. Serokwezîrên Îsraîlê jî di daxuyaniyekê de hevdem ku tekezê li ser hewldan bo bi destveanîna alîkariya cîhanî li dijî Îranê dike, di heman demê de jî tîne ziman ku em dikarin bi xwe çawan ser bi xwe jî bersiva rejîma Îranê bidin.

Di rewşeke wiha de, tê texmîn kirin ku erîşa han barê pirsgerêkan veguhaze kabîneya nû hilbijartî ya Îranê û bibe astengeke din ser rêya danûstandinên li dor “Bercam”ê ku hêviya mezin a berpirsiyarên sereke yên rejîmê ye ji bo derbasbûnê ji qeyranan. Helbet aliyê din jî ya destpêkirina gotûbêjan li dor bernameya navîkî ya Îranê, vedigere ser siyaseta karê Serkomar û civata hikûmeta nû ya Îranê.

Nan bi nirxa can



N: Sîna Qasimîzade

Wan rojan kêk kesek heye ku navê kolberiyê nebihîstibe û ji pirsgirêkên kolberan bê agah be.

Hebûna karek baş bo dabînkirina hevcehiyên deşpêkî, yek ji arîşeyên herî micid bo mirov û bi taybetî li Îranê ye ku bi sedema gendelbûna sîstemê, rewşa aboriya Îranê xirabtir û rêjeya bêkariya xelkê bigiştî roj bi roj zêdetir dibe.

Kolberî ne karek xweş û hêsan e û ne jî karek e ku tu yek ji xortên Kurd bi xwaştî xwe helbijartibe, belkî neçarî ye, ji ber vê ku rejîma Îranê di nav wan 42 salan de li cudatîdanîn, zilm û zorî, givaşa aborî, bêkarî, kêmiya dahatê û dehan mînakên din ji sebebên girîng û sereke eve ye ku di herêmên ser sînora li Rojhilatê Kurdistanê û parêzgeha Sîstanûbelûçîstanê bi sedema nebûna pirojeyên mezin yê karî, kompaniya û sîstemeke sermayedarî dibine sedema kêmkirina dahatîyê û xelkê Rojhilatê Kurdistanê jî neçar in bo vê ku şermizarê sifreya zarok û jiyana xwe nebin deşt diavêjine karên dijwar ku yek ji wan kolberî ye.

Di rastî de li Îranê kolberî ne tenê arîşeyekî aborî ye, belkî arîşeya siyasî û ewlehî ye, tîrsa rejîma Îranê li Kurdistanê eva ye ku ew Kurdan bi cudaxwaz û serbixwexwaz dizane. Bêkarî û nebûna pirogramên aborî, nebûna bazarçeyên mezin yek ji sedemên siyaseta gendel e. Divê bê gotin ku Kurdistanê Îranê ti pirogameke aborî bi awayekî rêkûpêk û herwisa ti peywendiyekê aborî jî di navbera Kurdistan û navendê de tineye.



Di Kurdistanê Îranê de her sal sedan kolber tene kuştin û birîndarkirin. Hezaran kesan li ser wê axê bi sedema hejarî, bêkarî û nedariyê canê xwe bo peydakirina nanekê ji deşt dane.

Kolber ew kesek ye ku barê çend beraber giran ji xwe hildide û di rêyên dijwar de ji herdu aliyên sînora de hatûcûnê dike. Dijwariya rêyan aliyekê, gef, lêdan û îşkenceya hêzên ser sînora jî aliyek dinê ye. Hêzên ser sînora gelek caran wan diidne ber gulleyan. Gelek caran jî bi wan re dibêjin hûn alîkariya Partiyên Kurdî dikin û bi wan hecetan kolbera binçav dikin, lêdidin û bêrêziyê bi wan re dikin.

Tevî ku Rojhilatê Kurdistanê çavkaniyê herî dewlemend ya kangehên binerdî ye jî, lê rojane em şahidê nûçeyê kuştin û birîndarbûna kolberan li ser sînora di navbera Rojhilat û Başûrê Kurdistanê û Rojhilat-Bakurê Kurdistanê de dibîsin. Çavkaniyên herî baş yê neft, gaza xwezayî û herweha zewiyên dewlemend yê çandiniyê û avê li Rojhilatê Kurdistanê ye. Lê tim hejarî, bêkarî û pirsgirêkên aborî para xelkê Kurdistanê bûye.

Li gor amara navenda amarî ya Saziya Mafê Mirovî ya “Kurdpa”yê, di heyamê 5 mehên deşt-pêka sala 1400`an de, bi giştî 78 kolberên Kurd hatine kuştin û birîndarkirin.

Kuştî: 11 kes

Birîndar: 67 kes

Awayê kuştin û birîndarbûna kolberan:

Teqeya rasteraşt ya hêzên leşkerî yê Îranê: 53 kes

Teqeya hêzên leşkerî yê Tirkiyê: 5 kes

Kevtina bin reniyê û mirina bi sedema sirê: 1 kes

kevtina ji bilindahiyên ve: 5 kes

Lêdan û îşkence ji aliyê hêzên leşkerî ve: 10 kes

Teqeya rasteraşt ji aliyê hêzên Îraqê ve: 1 kes

Sekinîna dil di dema kolberiyê de: 1 kes

Teqîna mînê: 1 kes

Xendiqîn û kevtina nav çem, bi sedema lipeykevtina hêzên leşkerî: 1 kes

Hind ji wan haletan bi sedema teqeya rasteraşt bi awayê regbarê bû ye ku di encamê de kolber bi awayê girûpî hatine kuştin û birîndarkirin.

Têbînî: Tenê hêzên leşkerî yê Îranê bo kolberên Rojhilatê Kurdistanê cihê tîrsê nînin, teqeya hêzên leşkerî yê Tirkiyê, kevtina xwarê ji bilindahiyên ve, kevtina nav çem û xendiqîn, teqîna mîna, giraniya bar, sir û seqem û dehan mînakên din hene ku dibine sedema kuştin û birîndarbûna kolberan. Di Kurdistanê Îranê de nêzî 170 hezar kolber hene û zêdetirîn rêjeya kolberan, kuştî û birîndar yê bajarên Merîwan, Serdeşt, Şîno, Bane, Newsûd û Kirmaşanê ne.

Rewşa Îranê bo wiha ye?



N: Cemal Resûl Dinxe

Min ti manşêtek baştir ji wê mijarê peyda nekir ku him bikarim rexneyan bigrim û him lêkolînê bikim. Ji pêşekînivîsînê jî derbas bûm û rasterast herme ser mijarê. Siyaset di Rojhilata Navîn de ji her tişkekê zehmetir e ku mirov bikare pêşbîniyan bike. Çimkî siyaset di wê deverê de di xizmeta xelkê de nîne, belkî bo berdwamkirina desthiltan e. Ti yek ji welatên deverê pêwendîyeke wisa digel welatên dinê tinîne, meger pirs ewlehî be an li dijî aliyekê dinê be wê demê pêwendî tene kirin.

Em her roj em li civînên siyasî û ragihandinan dibînin û dibihîzin ku di hevdişînekê de du aliyên siyasî li derheq pirsên deverê gengeşe kirine. Wan heyetane li ser rewşa deverê û bi taybet Îranê danûstandin kirine û bi 10an manşêten wiha her rojê tene dîtin û bihîştin.

Lê pirs eva ye ku ma rewş bi wî qasî aloz e ku em bawer nakin, an em wa difikirin ku lêkolîn û analîza rewşa welatêkê wekî Îranê bûye bi çanda gotinên siyasî. Niha ku wan nivîsan dixwînin, tenê bîstekê bisekînin û li ser mijara Kurd û Kurdistanê Îranê bihizirin? Nerizayetiya di Îranê de? Girtin û binçavkirin? Serkut û çendîn pirsgerêkên din; Ma gelo ew mijarên nû ne an na? Kîjan pirsgerêk û kîjan pirs bûye? Ma lêkolîn û analîza rewşa niha ya Îranê ti alîkariyekê bi çareserkirina wan pirsgerêkan kiriye an na? û çendîn pirsyarên din.

Niha ku li ser wê beşê bisekînin, axo pirsgerêk û pirsên Îranê zêdetir dibin an kêmtir? Çima belê û çima ne?



Bê şik her kesek li ser vê bawerê ye ku pirsgerêk di Îranê de netenê kêmtir nebûne, belkî zêdetir bûne û em gelek dibihîzin ku tê gotin rewşa Îranê wekî enbareke barûtê ye ku herdem rengehiya teqîna wê heye. Ew gotine li ser Rojhilata Navîn jî tene gotin.

Axo bi rastî hinde lêkolînkirinên li ser rewşa deverê û şirovekirina wan ti alîkariyek bo çareserkirina pirsgerêkên xelkê wan welatan kiriye? Welatên Rojavayî rewşa deverê çawa dinirxînin û me çi nirxandinek heye? Bê guman ew rewşê bo pêgeh û berjewendiyên xwe bi metirsîdar dibînin lê xelkê wan welatan jiyana xwe di metirsiyê de dibînin ku ew du core nirxandin gelek digel hev cuda ne. Rewş her wekî gotina helbesta “Xeyyam” e ku gotibû, “yek derd dixwaze û yek derman, yek gihîştin bi hev û yek jî dûrketin dixwaze”.

Ji her aliyekê ve ku em mîzêyê rewşa Îranê bikin, ne tenê di nav pirsgerêkan de ye, belkî di binbestê de ye. Desthîlta çendîn dehikên rejîma Îslamî ya Îranê li ser cûgrafiya Îranê ti destkevtêk tinebûye ku bikarin wan baştir bikin an heta rê ji zêdetirbûna pirsgerêkan bigirin. Desthilatek ku her pirsgerêkekê înkâr dike û di felsefeya olîya xwe de hêcet û wateyan bo datîne, encama wê bûye rewşa îro ku em dibînin.

Hejarî, bêkarî, leşfiroşî, dizî, tûşbûn bi madên hişber, daketina rêjeya zevacê, pîrbûna civakê, pirsgerêkên ekolojîkî, bê avî û kêmtir avî, bilindbûna nirxan, enfilasyon, daketina nirxa perê Îranê, derdornişînî, nebûna birêveberî, binçavkirin, îdam, serkut û bi 10an haletên din bi sedema desthilata rejîma Îranê ne.

Axo ew rewş ya vê yekê ye ku bê analîzkirin an dibe rêkarekê bo çareserkirina wan peyda bikin. Axo mijara wê yekê ku Tehran gefeke micid li ser deverê ye hewcehî bi lêkolînê heye? Xelkê Îranê divê bi hêviya rizgarkerekî be an divê bi yekîtiyê di herifandina rejîmê de alîkariyê bike. Ma tevahiya nerizayetiya li şeqamên Rojhilatê Kurdistanê û Îranê hewcehî bi şirovekirinê hene an divê rêxistina xelkê bona herifandina wê rejîmê bikin.

Welatên Rojavayî, alîgirê xelkê Îranê ne, lê hekî bizanin ku dikarin digel rejîma Îranê li hevhatinekê bikin, bê guman rejîma Îranê servetir ji xelkê datînin. Bi caran me ev xale bihîştîye ku Ewropa û Amerîkayê gotine am daxwaza rejîmêke asayî dikin ku me dît dîktator digel daxwaza Ewropayê rê kevt.

Bûyer û qewimiyên hundirê Îranê ti hewcehiyek bi analîzekirina rewşê nînin, dibe bi kiryar karekê bê kirin û hekî dem ji dest here, êdî nayê qerebûkirin.

Nerîna Lîderan



“Benny Gantz”:

“Rejîma Îranê pîrsgirêkek cîhanî ye, Îsraîl amadeyê êrîşkirinê li ser Îranê ye”.



“Ned Price”:

“Peyama me bo Serkomarê nû yê Îranê gelek rohn e û ev jî eva ye ku em piştewanî ji ewlehiya netewî û berjewendiyên hevpeymanên xwe dikin”.



“Barbara Woodward”:

“Birîtaniyayê hin medrek li ber dest hene ku nîşan dide Îranê di êrîşa ser nefkêşa Îsraîlê de mudaxîle kiriye”.



“Hulusî Akar”:

“Em dixwazin balafîrxaneyê “Kabul”a paytexta Afغانîstanê bi rê ve bibin”.

Bi hatina Reyîsî jî piştî Îranê li navçeyê her vala ye!



N: Eskender Ceiferî

Piştî ku Îbrahîm Reyîsî bû serokkomar, ti yek ji dewletên Îsraîl, Seûdî û Amerîkayê pîrozbahî li wî nekirin. Wan berê dema Rûhanî jî ragihandibûn ku ew rêzê ji dengê xelkê re digirin lê divê Îran dawiyê li zulmê bîne û piştewaniya terorê jî neke.

Piştî hatina Komara Îslamî û tîkçûna rejîma Pehlewî, pêwendiyên di navbera Îran û Amerîkayê û Îran û Seûdiyê de jî xirab bûn. Sala 1979’an piştî ku Xumeynî rejîma Komara Îslamî ava kir, saziyek bi navê Xwendekarên Rêbaza Xumeynî êrîşî ser sefareta Amerîkayê li Tehranê kir. Sala 1981’an Îran û Amerîkayê li ser berdana 66 dîplomatên ku Îranê girtibûn, lihev kirin. Lê ji wê demê ve hemû pêwendiyên xwe yê dîplomasiyê, qut kirine.

Sala 2015’an Amerîkayê li banka Fransî ya Parîbas dest daniye ser pereyên Îranê û ew pere ku nêzîkî çar milyon Dolaran bû, dane wan dîplomatan ku Îranê 444 rojan ew girtibûn. Îranê hewl da wan pereyan vegerîne, lê nekarî. Îran hertim, Amerîka û Seûdiyê weke du hêzên mezin binav dike ku bi alîkariya Îsraîlê, dijatiya Komara Îslamî dikin.

Ev çend sal in ku pêwendiyên di navbera Îran û Seûdiyê de jî bi giştî qut bûne. Aloziya di navbera wan de jî piştî wê hat ku hejmareke zêde ji heciyên Îranî li wir mirin. Piştî re hêzên nêzîkî Sipaya Pasdaran ku xwe weke xweser binav dikirin, êrîşî ser balyozxaneyê Seûdiyê li Tehranê kirin.

Dijberên rejîma Komara



Îslamî dibêjin sîstema wî welatî nikare mafên neteweyên cuda bide wan. Ji ber wê jî her aliyek siyasî, bi nerînên xwe nêzîkî yek ji wan dewletan e ku Îran dijatiya wan dike û hertim slogana jinavbirina wan hildide.

Neyarên Komara Îslamî jî dibêjin ku Reyîsî qet nikare mafê neteweyên nefars li wî welatî bide. Ew dibêjin sedem ev e ku di yasaya binge-hîn de tiştek wisa tine ye. Gotinên bi vî rengî li navxwe jî derketin.

Heman roja ku Reyîsî bû serokkomarê rejîmê û Mihemedcewad Zerîf wezîrê Derve, bang li dewletên Erebyan derdore kir ku ji bo pêwendiyên baştir tevbigerin, Îran rastî mezintirîn civîna ji bo goşegirkirina wê sîstemê hat. Berî niha dema Rûhanî jî serkirdeyên hemû dewletên misilman ji xeynî Îran û Sûriyê, beşdarî civînekê bibûn ku Melîk Sulêman şayê Seûdiyê û Donald Tramp serokkomarê Amerîkayê li Riyazê ew civîn birêve dibirin. Têde metirsiya Îranê, ji ya Dewleta Îslamî DAÎŞ’ê mezintir hatibû binavkirin û hatibû ragihandin ku Îran, piştewana terorê ye. Tramp û Melîk Sulêman li cem 40 serkirdeyên dewletên îslamî gotin ku Îran ji 1979’an ve bûye gef li ser navçeyê. Lê dengê zêde lîdij, ji wan 40 serkirdeyan derneket.

Hin berpîrsên Îranî, carna dibêjin tevgerên partiyên Kurdî weke Partiya Demokrata Kurdistanê Îranê û Komeleya Şoreşgêrên Zehmetkêşên Kurdistanê Îranê bi hemahengî ligel Seûdî re

ne. Lê ew partî, tim vê îdiayê red dikin. Berê jî Ebolfezl Hesên Bêgî endamê komîsyona siyaseta derve ya parlamentoya Îranê gef li neyarên sîstema Îranê yê li Başûrê Kurdistanê xwaribûn û gotibû ewê ji bo jinavbirina wan 40 kîlometran derbasî kûrahiya Îraqê bibin ku mebesta wî Herêma Kurdistanê ye. Ew gefê li rêxistinên Belûçan jî dixwe û dibêje em rê nadin ji Efxaniştan û Pakîstanê derbasî nav Belûçîstana Îranê bibin û endamên Sipaya Pasdaran bikujin. Ebolfezl Hesên Bêgî tekezê dike ku Seûdî û Amerîka li piştî Ceyşul Edla Belûçan, PDKÎ û Komele ne.

Qet ne ji bîra xelkê diçe û ne jî ji bîra rejîma Tehranê diçe ku Donald Tramp serokkomarê berê yê Amerîkayê di civîna xwe de li Rizayê bi amadebûna serkirdeyên ji Îraq, Efxaniştan, Pakîstan û 37 dewletên din got ku divê hemû alî li navçeya Rojhilata Navîn, ji bo goşegirkirina Îranê tevbigerin. Amerîka, heya niha jî her li ser heman rêbazê ye. Wî tekez jî kir ku Komara Îslamî, terorîstan perwerde dike û ev dehan sal in ku agirê kîn û şer li navçeyê xweş dike û dixwaze Îsraîlê jinav bibe. Wî got ku dewsa destên Îranê li Yemen, Sûriye û Îraqê xuya ne û ev jî li ser berjewendiyên wan gef in.

Çavdêr jî dibêjin ku bi hatina Reyîsî û Joe Biden jî ti tiştek nayê guhertin û dibe ku êdî hevpeymaniya Seûdiyê li dijî Îranê mezintir bibe ku ev nêzîkî çar salan e li navçeya Kendavê pêk hatiye.

Efxaniştan û leyîza qumarê



N: Ebdûlazîz Qasim

Tê zanîn ku pirsê vekişandina hêzên leşkerî yên Amerîka ji Efxaniştanê her ji serdema Serokê berê yê Amerîkayê, “Donald Trump”, heta gulana 2021’an hatibû diyarkirin, lê piştî hatina serokê nû yê Amerîkayê “Joe Biden” demê vekişandinê bi çend heyvan bi paş ve xist, û gotibû ku heta roja 11 îlonê/ septembar 2021’an ku wê hemû hêzên xwe ji Efxaniştanê vekişîne.

Lê berî çend rojan, Serokê Amerîka “Joe Biden”, ragihand ku wê piroseya vekişîna hêzên Amerîkayê ji Efxaniştanê li roja 31’ê tebaxê bi dawî bibe, û got ku Waşington “armancên xwe bi deşt ve anîn” û di dijberiya terorê de bi serkeft, lê ji aliyê Rûsyayê ve, ev yek bi şikeştin hate ragihandin, ku li gorî daxuyaniyên rayedarên Rûsiya û daxuyaniya Zerîfê wezîrê derve yê rejîma Îranê ku vekişandina hêzên Amerîkayê ji Efxaniştanê bi “şikeştin” anîn ziman, hevdem li gorî gelek şirovekerên siyasî ku dibe ev vekişandin bibe sedemek ji bo peydabûna aloziyeke mezin di herêma de, bi taybetî piştî 20 salan ku Talîban careke din xwe ji bo kontrolkirina Efxaniştanê amade dike.

Îro, piştî vekişîna hêzên Amerîka ji Efxaniştanê, gelek dewlet kar ne ji bo peydakirina ewlehî û aştiyê li Efxaniştanê, berevajî ku bêhtir kar ji bo zêdekirina deştilatdariya xwe li ser qada deverê dîkin, bi taybetî Tîrkiya û Îran.

Ku rejîma Îranê ji aliyê xwe ve, ev yek wekî fersendek dît, ji bo berfirehkirina bandora xwe, ku yekser rabû bi mêvandariya nûnerên hikûmeta Kabul û tevgera



Talîban li Tehranê, di hewlekê de ji bo xwe bi Talîban û herwiha bi hikûmeta Kabul jî xwe bide qebûlkin, tevî ku hemû pêşhatên li ser erdê diyar dîkin ku Talîban wê careke din û di demeke nêzik de piraniya qada Efxaniştanê kontrol bike û dibe rewş ber bi şerekî navxweyî yan şerekî bi wekalet biçe.

Piştî rêkkestina li ser parastina firokxaneyê Kabul di navbera Amerîka û Tîrkiyê de, û li gorî gotarekî bi navê “Idlibeke nû” ji aliyê Navenda Lêkolînên Ehram li Misrê, tê de bal kişandiye li ser hewldan û amadekariyên Tîrkiyê ji bo veguheştina çeteyên çekdar û komên terorîst ji Idlibê ber bi Efxaniştanê, tevî ku berdevkê Talîban ragihand ku ew hêzên leşkerî wekî beşek ji NATO qebûl nakin

û herwiha hişyarî da Tîrkiyê, herwiha Nûnerê Taybet yê Serok Putin li Efxaniştanê Kabulov got ku nabe pêvajoya vekişîna hêzên Amerîkî ji Efxaniştanê bibe deşt-pêk ji bo bicihkirina hêzên NATO yan hêzên Amerîkî di welatên Asiya Navîn de, lê heta niha ji aliyê dewleta Çînê ti helwest yan daxuyanî nehatine ragihandin, ku dibe nerazîbûna xwe nîşan bide li hember veguheştina komên terorîst di nav de komên terorîst yên wekî “Îgor” ji Idibê ber bi sînorên wê, ku dibe ev yek bibe sedema zêdebûna çalakiya rêxistinên terorîst yên wekî “Talîban”, “El-Qaîde” û “DAÎŞ” li Efxaniştanê ku dikeve li ser sînorê Çînê û çend komarên Soveyta berê.

Ji aliyekî din ve, ku pirsê vekişîna hêzên Amerîkî ji Efxaniştanê, tirsek mezin xis-

tiye di nav alîgirên Amerîka de çî li Îraqê û çî li Sûriyê, bi taybetî di nav miletê Kurd de, ku dibe Amerîka bi heman awayî hêzên xwe ji Îraqê û Sûriyê vekişîne, ku helbet wê bandora vê yekê li ser rewşa Sûriyê hebe û nabe Kurd bi xemsarî serederiyê ligel vê pirsê bikin û pêdiviya bi zûtirîn dem diyaloga kurdî-kurdî bigehîje armancên xwe ji bo yekrêziya navmala kurd.

Her çend ku hindêk şirovekarên siyasî dibînin ku vekişîna hêzên Amerîkî ji Efxaniştanê dav û xapandineke ji bo nakokiyên bêxe di navbera Rûsiya, Çîn, Tîrkiya û Îranê de, bi taybetî ji bo Çînê têxe di nav yariya qumarê de, lewra her wekî dibînin ku Çîn bi hişdariyeke mezin ve mêzeyê vekişîna hêzên Amerîkî dike.



Di girtîgeha Urmîyê de girtiyek bo cîbecîkirina cezaya îdamkirina wî bo odeya take kesî hate veguhaştin

Sibêdeha roja Çarşemî 13'ê Gelawêjê, girtiyek ê bi navê “Îbrahîm Nesîrîxa”, xelkê bajarê Selmasê bo cîbecîkirina cezaya îdamkirinê, bo odeya take kesî ya bajarê Urmîyê hate veguhaştin.

Ew girtiye bi tohmata, “tawana madeyên hişber” ji aliyê dezgehên dadweriyê ve bi îdamkirinê hatibû cezakirin.

Di wê derheqê de, sibêdeha roja Dûşemî 11'ê Gelawêjê, cezaya îdamkirina sê girtiyan ên bi navên “Sipêhr Ebasnîjad”, kurê Behmen, xelkê gundê “Tulekî” yê ser bi devera Tîrgewer a bajarê Urmîyê, “Eskender Zar`î”, kurê Îbrahîm, xelkê gundê “Zindeşt” ê ser bi bajarê Selmasê û “Hemze Rizayî”, kurê Rîza û xelkê gundê “Qesîrk” ê ser bi bajarê Selmasê, di girtîgeha navendiya bajarê Urmîyê de hate cîbecîkirin.

Herwisa ev berê bi tohmata “tawana madên hişber” ji aliyê dezgeha dadwerî ve bi îdamkirinê hatibûne cezakirin.



Kedkarên işkevta “Qurî Qela”yê 7 meh e ku heqdestên xwe vernegirtine



Kedkarên işkevta geştîyarî ya “Qurî Qela” ya ser bi bajarê Rewanserê, 7 meh e ku ji aliyê şaredariya wî bajarî ve mûçeyê wan nehatiye dan.

Çavkaniyên xwecihî yên bajarê Rewanserê bas ji vê yekê dikin ku 10 meh e heqdestên kedkarên işkevta “Qurî Qela” ya wî bajarî nedane û di wan 10 mehan de, bi tenê pereyê 3 mehan bi wan re hatiye dan.

Nedana mûçeyên kedkarên wê işkevta geştîyarî di halekê de ye ku tevî bilindbûna nirxên kelûpelan, ew kedkarane raştî pîrsîgîrêkên aborî û malî hatine.

Işkevta “Qurî Qela” mezintirîn işkevta avî ya Rojhilata navîn e ku derbasbûya wê vedigere bo 65 milyon sal berî niha û ew işkevt di 25 kîlometriya bajarê Rewanserê de ye.

Welatiyekî xelkê bajarê Serdeştê ji aliyê hêzên Spahê ve hate birîndarkirin



Êvareya roja Sêşemî 12'ê Gelawêjê, welatiyekî Kurd ê bi navê “Elî Ebdullah” xelkê bajarê Serdeştê bi sedema teqeya hêzên Spaha Pasdaran li ser sînorê wî bajarî bi awayekî dijwar hate birîndarkirin.

Televîziyûna Kurdistan24 bi bilavkirina wê nûçeyê, ragihandî ye: Ew welatiye di navbera gundên “Şîne û Zelê” de kevtiye ber gulleyên hêzên Spaha Pasdaran.

Ew welatiye di wê bûyerê de sermilê wî bi awayekî dijwar hatiye birîndarkirin û bo tedawiya pîzîşkî bo nexweşxaneyê bajarê “Qeladîzê” yê ser li Herêma Kurdistanê hatiye veguhas-tin

Heta niha ti zanyariyek li derheq sedema teqeya hêzên Spaha Pasdaran li wî welatiyî nehatiye belavkirin.

Dengbêj Kawûs Mîlanî nexweş e

Dengbêj navdar ê xelkê Makûya ser bi bajarê Rojhilatê Kurdistanê “Kawûs Mîranî” bi Koronayê ketiye û rewşa wî jî xirab e.

Nêzî du hefteyan e hunermendê kurd yê Rojhilatê Kurdistanê Kawûsî Mîlanî bi nexweşiya Koronayê ketiye û niha li yek ji nexweşxaneyên bajarê Urmiyê de hatiye razandin.

Hunermend Îsmail Xelîlî ku hevalekî nêzik yê Kawûs Mîlanî ye, li ser rewşa wî ji



BasNewsê re got, hunermend Kawûs bi Koronayê ketiye û rewşa wî jî mixabin baş nîne.

Xelîlî her wiha got, Mîlanî niha di beşa ICU ya

nexweşxanê de hatiye razandin.

Li gorî agahiyên hunermend Îsmail Xelîlî, birayê wî Yûsif Xelîlî jî, ku ew jî yek ji hunermendên aktîf yê Rojhilatê Kurdistanê ye, bi Koronayê ketiye lê rewşa wî ber bi başbûnê ve diçe.

Kawûs Mîlanî xelkê gundê Daylan yê bajarokê Poldeşt yê bajarê Makû yê Rojhilatê Kurdistanê ye.

Mîlanî 55 salî û bavê sê zarokan e û derdora 25 salan e li Ormiyê dijî.

Hunermend Kawûs Mîlanî, li kêleka dengbêjiyê û bo dabînkirina debara jiyana xwe paletî dikir û di rewşek kambax de diya. BASNEWS

Hejmara Pêncemîn ya Kovara Bernamegeh derket

Kovara edebî, hunerî, Çandî û civakî ya “Bernamegeh” bi hejmara xwe ya Pêncemîn derket pêşberê xwendevanên xwe.

Di vê hejmarê de gelek gotar, çîrok û helbest ji aliyê nivîseran ve hatine nivîsîn.

Di vê hejmarê de Nihat Gültekin mijara Fêrîkê Ûsiv, Hecîyê Cindî û Fîncana Rîza Kurmet hildaye dest, Occo Mahabad behsa helbestvanê hêja yê dema Osmanî Şikriyê Bedlisî kiriye, Siraç Oguz berê xwe daye jiyana xebatên Dr. Nûrî Dersimî û daye pey dewreke girîng, Lokman Polat li ser edebiyatê û hunera vegotinê sekiniye da ku baştir bê fêmkirin. Di vê hejmarê de gellek gotar, çîrok û helbest li benda xwendin û nirxandina xwîneran in.


Hûn dikarin di vê hejmarê de van nivîsan bixwînin:

– Nihat Gültekin / Fêrîkê Ûsiv, Hecîyê Cindî û Fîncana Rîza Kurmet

– Nûroj Munzur / Notayên Bê Xew

– Occo Mahabad / Di Qesrên Osmanî de Helbestvanek: Şikriyê Bedlisî

– Nezehat Dogan / Êşpereştî



– Lokman Polat / Di Edebiyatê De Hunera Gotinê

– Serdar Kömürcü / Lê Tu Çû

– Ersin Tek / Peyv

– Cahit Aybar / Bo Tenê Em

– İkrâm Oguz / Dengbêjî û Axaftina Stranbêjan

– Rêber Hebûn / Keça Kanî

– Roştêm Xamoş / Ez Zarokîm

– Keyhan Mihemedîniyad / Gelê Kurd Piştî Bi Dawîhati-na Peymana Lozanê Dê Bibe Bi Dewletek Serbixwe?

– Hasbeg Koksâl / Heyva Çardeşevî

– Rûbar Elî / Tu Bi Xêr Hatî

– Konê Reş / Bi Xêra Mîr Celadet Bedirxan Zimanê Me ji Axaftinê Bûye Zimanê Nivîsandinê

– Xîzan Şîlan / Çavzeytûna Min

– Remezan Bakur / Li Kurdistanê Nasyonalizima Bawerî û Bîrdozîyan

– Azad Ekkaş / Îdameke Li Taximê Gund

– Dennis Dargul / Ala Min

– Îhsan Bîrgul / Ziman û Siyaset

– Ciwan Serhedyan / Ez ê Werim

– Siraç Oguz / Dr. Nûrî Dersimî Ronahîya Çavê Gelê Kurd e!

– Dilazad A.R.T / Nêrîneke Giştî Li Ser Edebiyata Nûjen Ya Kurdî

– Zozan Sarica / Evîn û Êş

– Mervan Serhildan / Xewna Min

– Çayan Okuduci / Venekir

– Mehmûd Badilî / Vexwendina Li Malê

– Mamo Kader / Di Navbera 2 Metreyan û Valahiyê de

– Rûmet Med / Pêşengê Sînemaya Rêbaza Raştîbîniya Nû; Vittorio De Sica

– Ehmedê Goyî / Helbest

– Muqades Agirî / Stêrka Helbestan Meştûre Erdelan

– Ezîzê Gerdenezî / Çil Romanên Kurdî

– Rojbîn Özkan / Çîrokek Ji Devê Bavê Min Melle Muhammed: Arraf (Pispor)

– Umîd Demîrhan / Kurd û Teoriya Dewletê

– Helbest: Wefî Leyla – Bavê Min Mir / Wergera Kurdî ji Erebi: Mîran Dilêr

– Soran Hemereş / ÊL Begê Caf : Mux, Pîrmend û Pêşbînvanekî Mezin Ê Kurd Ê Ji Bîrçûyî?

– Wergera Ji Zaravayê Soranî: Muhsîn Özdemir

– Newaf Mîro / Êzîdiyo

– Bahadîn Robar / Girîngiya Zimanê Nivîskî

Binpêkariyên mafê mirov di Kurdistanê de

Çalakvana medenî ya bajarê Îlamê Sumeye karger digel çar kesên din bi 38 sal girtîgehê hatine cezakirin

Çalakvana medenî ya xelkê bajarê Îlamê “Sumeye Karger”, digel çar kesên din ên bi navên “Nahîd Teqwayî”, “Behare Silêymanî”, “Nazenîn Mihemednijad” û “Mêhran Reûf”, ji aliyê taya 26 a dadgeha şoreş a bajarê Taranê bi serokayetiya dadver “Îman Efşarî”, gelemper bi 38 sal girtîgeha te`izîrî hatine cezakirin.

Nûçegihaniya “Hêrana” di wê derheqê de belavkiriye ku ew 5 kese bi “beşdarî li birêvebirina girûpên neyasayî û çalakiyên piropagende li dijî nizamê”, hatine tawanbar kirin û “Nahîd Teqwayî” û “Mêhran Reûf”, bi 10 sal û 8 meh girtîgeha te`izîrî, “Someye Karger” û “Behare Silêmanî” bi 6 sal û 8 meh girtîgeha te`izîrî, “Nazenîn Mihemednijad” bi 3 sal û 4 meh girtîgeha te`izîrî, hatine cezakirin.

Welatiya xelkê bajarê Îlamêye “Sumeye Karger” ku derçûya beşa Felsefe li zankoya bajarê Tewrizê ye, li rêkevtê 25`ê Gelawêja sala 1399an, ji aliyê Îtla`ata Spaha Pasdaran ve li mala wê de li bajarê Tehranê hatibû binçavkirin û bo benda 2 ya “Elif” a girtîgeha Êvînê hatibû veguhaştin û piştî 4 mehan bi girtîgeha “Qerçek a Weramînê hatibû veguhaştin.

Ew çalakvanê medenî roja çarşemî 8`ê Banemerê, piştî derbasbûna nizî 6 mehan li benda 2 a Elif a girtîgeha “Evîn” û girtîgeha “Qereçek” bi danîna barimteya 500 milyon tomenî hatibû azadkirin.

Ebdulezîz Gulmihemedî hate binçavkirin û bo girtîgeha Urmîyê hate veguhaştin

Roja Înê 8`ê Gelawêjê, welatiyekî Kurd ê bi navê “Ebdulezîz Gulmihemedî”, xelkê bajarê Urmîyê hate binçavkirin û bo girtîgeha wî bajarî hate veguhaştin.

Ew welatiye li roja 16`ê Rezbera sala 1398an, ji aliyê hêzên ewêlehî ve li bajarê Urmîyê hatibû binçavkirin û piştî 2 mehan lipêrsînê ji girtîgeha Îdareya Spahê, bo girtîgeha navendî ya bajarê Urmîyê veguhaştibûn.

“Ebdulezîz Gulmihemedî” li deştîpika meha Rêbendana sala 1399an, ji aliyê taya 2 a dadgeha şoreş a bajarê Urmîyê, bi tohmata “endambûn li yek ji Partiyên Kurdî yê dijberî hikûmeta Îranê” bi 10 sal û 1 roj girtîgehê hatibû cezakirin û roja 7`ê Rêbendana hemen salê, bi danîna barimteya 1 milyar Tumenî hatibû azadkirin.

Binçavkirina wî welatiyî bo cîbecîkirina cezaya wî di halekê de ye ku ew cezaye heyamek berî niha ji aliyê taya 41 a diwana bilind a welat ve hatibû redkirin û careke dinê bo pêdaçûnê bo taya hevalî ya dadgeha şoreş a bajarê Urmîyê şandibûn û heya niha cezayek nehatiye dan.

Şeş welatî li bajarê Şinoyê ji aliyê hêzên ewlehî ve hatine binçavkirin

Roja Dûşemî 11`ê Gelawêjê, şeş welatiyên Kurd ên bi navên “Ferhad Me`irûfî”, xelkê gundê “Alyawê”, “Rehman Esedî” kurê “Mehmûd” xelkê gundê “Aliyawê”, “Ubeyd Enwerî”, kurê Rehîm, xelkê gundê “Alyawê”, “Hesen Şadîxa”, xelkê gundê “Sînganê”, “Rêbwar Çarîkdarî”, temen 22 salî, kurê Mihemed, xelkê bajarê Şinoyê û “Celal Qadîrzade”, kurê Ebdulla xelkê bajarokê “Nelosê”, ji aliyê hêzên ewlehî ve hatine binçavkirin.

Hêzên ewlehî, ew şeş welatiyane bi bê hebûna ti belgeyeke yasayî binçav kirine.

Di navbera wan şeş kesan de, “Hesen Şadîxa” piştî çend demjimêr lipêrsînê hatiye azadkirin.

Ew pênc welatiyên din piştî binçavkirina wan bo cihekî nexuya hatine veguhaştin û heya niha ji qedera wan ti zanyariyek ji ber deşt nîne.

Heya dema belavbûna vê nûçeyê ji sedema binçavkirin û tohmata ku bi ser wan şeş welatiyan de hatiye sepandin ti zanyariyek ji ber deşt nîne.



Mirovkujek wekî Serkomar destbikar bû

